

Bangewazî ji bo Gelê me û Hêzên Niştimanî û Demokratîxwaz



Ji ber rewşa trajîdî ku gel û welatê me, Sûriye, tê re derbas dibe, hejmareke rewşenbîr ji hemû pêkhateyên civaka Sûrî (**Ereb, Kurd, Turkmen, Ermen, Asûrî, Durzî û Çerkes**) xwestin ku nexşerêyekê amade û pêşkêş bikin, ji bo dîtina çareseriyekê ji vê aloziya ku em tê re derbas dibin ku bi domandina xwe bûye mina çarenûsa me û arîşeyeke ku hemû hêzên navxweyî, herêmî û navdewletî li hemberê bêkêr mane.

Lewre, hejmarek ji rewşenbîrên hemû pêkhateyên Sûrî pêşniyaza lidarxistina kongireyêke niştimanî di bin dirûşma **“Hevalbendiya Niştimanî ya Demokratîk a Sûrî”** kirin, ji bo dîtîna rêyêke çareseriyê ya gunçaw ji aloziya Sûriyê re, ya ku encama parçebûna rikeberiyê û xemsariya hêzên herêmî û navdewletî di dîtina çareseriyêke mirovane ji herikandina xwîna Sûrî re ye.

Li ser vê bingehê em bang li hemû hêzên niştimanî û demokratîxwaz û çînên hişmend û rewşenbîr dikin, her wiha her kesê xwedî wijdan, pîspor di warê çareserkirina pîrsgirêk û kirîzan de, akademîsiyan, kesayetên serbixwe, rûsipî, zanyar, serkirdeyên meydanî yên bi rûmet, û her komeke siyasî, rêxistineke sîvîl û komeleyeke xêrxwaz, em hemûyan vedixwînin ku bi berpirsiyariya xwe ya dîrokî rabin, û di serxistina vê pirojeya niştimanî û demokratîk de cih bigrin, û destekê bidinê, çî li hundir welêt û çî li derve, ta ku em xwe ji bijardeyên metirsîdar biparêzin, nemaze di vê dema hestiyar de, ku gel û xaknigariya Sûrî giş tê re derbas dibe.

Komîteya Hevrêziyê

Hevalbendiya Niştimanî ya Demokratîk a Sûrî

Malpera Fermî ya hevalbendiya Niştimanî ya Demokratîk a Sûrî:

www.twds.info

PÊŞNÛMAYA MANÎFÊSTO

JI BO RAYA GÎŞTÎ



Sûriye ji destpêka dîrokê de bûye navend û dergûşa şaristaniya helesengandinê, ku dewlemendiya çanda mirovahiyê tê de xwedî bû. Ji ber giringiya cihê xwe yê xaknîgarî û ji ber ku ketiye navbera parzemînên sereke di cîhanê de, Sûriye, roleke balkêş ji bo hevdîtina çand û olên ezmanî lîstiyê, li hember hemû cureyên sitemkarî, tarîti, desthilatdarî û koletiyê ku bi destê hêzên koledar li ser gelên herêmê bi kar dihat di dirêjîya dîrokê de derketiye,.

Sûriye, hertim bûye bingeheke stratîcîk di belavkirin û parastina çandan de, ber bi Rojava û Rojhilata cîhanê ve, ji bo hevjiyana aştîyane û xurtkirina biratiya gelan, di çarçoveya rêzgirtina hevbeş û hevkarî di xêr û hezkirinê di navbera hemû cureyên mirovan de, li ser bingeha bawerî û ayîna olî û nefretkirina çanda tundiyê, kuştin û pişaftinê û di encamê de, rakirina vê çandê ji nav gelên cîhanê û guhartina vê bi zewaca çandan.

Dîrok tekez dike ku Sûriyê qubleya şaristaniya Rojhilatê ye, bi pêşketin û aştîya çand û perensîbê jiyana hevbeş a azad di navber ol, gel û hemû pêkhatayên xwe yê nijadî û rêolî (mezhebî) ji kevin û nû de, û nîşana vê yekê jî pircureyên mûzeyîkî û kevneşopî ya çand û şaristaniya xwe li her devera xaknîgariya Sûriyê.

Berdewamkirina şer û pevçûnan li ser gerestêrka me, erdê, dihêle ku mirovahî li pey peydakirina derfetên pêşxistina hebûna xwe ya kevin be. Ev nakokiya wiha, gelên sitembar gihandina rewşa pêşxistina amûrên berevanî û parastinê bi şêwazekî komkirina hêzên gelan li ser hev, ji bo ku karibin hebûna xwe ya xwezayî û berjewendiyên xwe yê xweristî û babetî li beramberî hêzên êrîşker biparêzin, di çarçoveya têkiliyên çandî û sincî yê ku nasnameya wê ya gîştî destnîşan dikin. Ev taybetmendiya wisa hîşt ku cewazî di navbera niştimanan û netewan de derkeve holê, û her wiha nakokî û dubendî navbera çandan û şaristanan û cewazî di navbera çîn û aliyên de derkevin holê di her asta xêr û şerî de.

Berdewamkirina van nakokiyan di her radeyê de, navbera van blokan û navendên hêzên gerdûnî deyên ku di pêvajoya pevçûnan de, bi gelek şêwaz û teşeyên curbicur derketiye holê, bi xwe di zayîna neahengiya berjewendiyên de di dirêjîyê dîrokî de ye. Lewre, di encamê de projeya dewletên neteweyî di sedsala 17an de, li Ewropa diyar bûye, ji bo ku raperîn û tevgerên demokratîk û gelêrî yê ku li dijî malgirtinê û dîlewgeriya ser bazarê û nepejrandina van tevgeran ku bibin hêzeke hevpar di talankirina xêr û berên gelên cîhanê de beravêtî bikin. Ev projeya dewleta neteweyî bûye sedema bingehin di derketina herdu şerên cîhanî yê yekem

û duyem de û di encamê debi milyonan mirovên bê guneh hatin kuştin û xişim û bêtar, rûxandin û talankirin çêbûn û her wiha welat û civak hatin parçekirin.

Îcar, nexşeya parçekirina Rojhilata Navîn li gor berjewendiyên hêzên dagîrker yê nû, ji bo ku serdestiya xwe ya aborî û siyasî fereh bikin çêbû, ev jî nîşana herî mezin e li ser vê şirovekirinê. Di encamê de, sîstemên dîktator, taîfeger û komikî derketin, ji bo ku bibin nûnerê wan hêzên navdewletî ta karibin talan û dizîna samanên aborî hêsanî bikin. Ev teşeya komrêxistinên wiha xwe kirin hêzeke zordest di rojevê de û tevahî maf û cureyên azadiyê desteser kirin, lewre, hişmendiya dijberî û dijminahî di nava gelên herêmê de, afirindin û siyaseta (ji hev bike tu yê bi ser kevî) bi kar anîn û dek û bêbextî di nava gel û olan de xurt kirin, ev rewşa rizî û tarî li gor berjewendiyên hêzên dagîrker hatin çêkirin ta karibin serdestî û zordariyê berferh bikin, lewre, sazûmanên neteweyî yê nijadperest ên dûr ji rewana gelê Rojhilata Navîn bi biyanî hatin damezrandin û danûstandinên şaristanî û çandî nava gelan de tune kirin.

Ezmûna dewletên neteweyî bûye sedema kuştina hêviyên gelan ya azadî û rizgarbûna ji koletiya hêzên dagîrker yê derve, û ta ku rê li ber rêbaza geşedanan di her astê de qut bikin, sîstemên tolîter cîbicîbikin û partiyên yekdest derxistin holê, ji bo ku serpêhatiya gelan desteser bikin, bi vî awayî hemû teşeyên azadiya yekane û komî çewisandin. Vê rewşê ezezî xurt kir û tirs li ser mejî û dilan mezin kir, ta ev civak kirin her wek keriyên lawiran bi riya sîstemên ewlekariya sitemkar ku hemû derfet û delîveyên azadiyê di civakên xwe de fetisandin.

Bi kurtasî hemû ezmûnên dîrokî tekez dikin, ku hişmendî û çanda dewleta neteweyî ya ku ji Rojava yan Ewropa derbasî Rojhilat Navîn bûye, ji bo çareserkirina girift û pisgirêkên gelan û di her astê de bi bin ketin. Ev ezmûn ne li gor çand û xwezaya rastiya çanda herêmê ye, mînak jî gelek in, hiştiya (zihniyeta) dewleta neteweyî ya Turkiya Kemalîst, Nasîriya Misirê, Beesa Sûriyê û Iraqê, Zayonîsta Îsraîlê û Îslamiya sexte ya Îranê). Ji ber ku projeya dewleta neteweyî beşek ji projeya neteweya dagîrkiriyê ye, ya ku di hembêza burciwaziya Ewropî de derket, ji bo dîlewgeriya li ser bazarên navdewletî û bazara kar, yek ji pêwîstiyên pêkanîna vê projeyê li ser erdê diva bû sîstemên dîktator û sitemkar biafirînin û gel û civakan pê biçewsînin û xêr û beran talan bikin, ji bo firekîrîna berjewendiyên xwe yê neteweyî yê teng. Em îroj nihirvan in li ser rewşa dijwar di herêma me de, û bi taybetî li Sûriyê, ev jî bê gûman, berhema hiştiya tolîterîzim û çanda yek ziman e,

Siyaseta zordestî û ewlekariya tunekirina kesên din a van sîsteman, pêşeroja gelan di azadiyê de ji holê rakir û çandeke aşlekirî ku damarên xwe digihêjin derve cîbicîkir, ev li şûna siyaseta cihêrengiya çandan û hevgerîna xwezayî û demoqratik dane meşandin ku berê di nava pêkhatiyên civaka Sûriyê de dihate jiyankirin. Ev ji bo ku samanên aborî bidest xwe bixe û dadweriya civakî di belavkirina wê de pêk neyîne û ew saman veguhaste samaneke neteweyî ji ya niştimanî û her wiha komeke biçûk sûd ji vê samanê û desthilatdariyê didît. Îcar projeyên

xwe yê n olî, taîfegerî pere peyda dikirin ji bo berdewamkirina kedxweriyê li ser civakê û bi hev dengiya digel berjewendiyên hêzên navdewletî yê malgirt û nijadperest, û lewre, ev sîstemên wisa ji xizmetkirina gelên xwe dûr ketin û bûn asteng li pêş pêşveçûna van gelan. Ev rewîştî û pêkanînen wihabûne sedema bingeîn ku pirsgirêk hên bêtir aloz bibin û civak hemû têkeve gola xwînê, lewre, rizgarbûn bi xwe re şoreşekê li ser asteke hişmendî diafirîne heya ku bigihêje asta guhartina binyada siyasî, leşkerî, aborî, çandî û civakî.

Dûrketina çîna zordest ji sinc û zagonan, û çavsorî û çekuziya komkirina mal û samanê, dihêlê bi giranî nakokî di sazî û kargêriyên dewletê de çêbibin, di gel serdestiya dezgehên ewlekariyê li ser jiyana rojane û binkeftin di çareserkirina nakokî û pevçûnan de, di navbera nişteciyan de, hên bêtir pêkanîna projeyên şovînîst(nijadperest) û ne sincî beramberî pêkhatayan, herwek zagonên awarte û taîfegerî di gel girtina azadiya nişteciyan û beredana mirovên siyasatmedar û xwediyên nêrînen cûda û rikeberan û girtina van rikeberan di zîندان de, û pêkanîna îşkenceyên derûnî û fîzîkî bi şewazên hovane ji ber tenê rikeber in di nêrînen û ramanê de, heya gihişte asta dadgehên engîzasyonê û tewanbarkirina wan bi sîziyên herî kirêt di bin xala îxaneta niştîmanî û parçekirina welêt de.

Ev hemû pêşk û kiryar hiştin ku dengvedana xwe di şoreşa Sûriyê de derkevin, ji ber aloziya rewşa Sûriyê û teqîna wê ku gel êdî guhartinê dixwaze, ji xwe ew serpêhatiya ku êdî bibû lekeyek şermê li eniya tevahî tevnên gelê Sûriyê. Lewre, mirov dibîne ku çawa agirê şoreşê her wek çîkan li ezmên belav dibû, hên bêtir, parçebûna asoyî û stûnî ya şoreşa Sûrî bi xwe encama çanda yek dewleta neteweyî ya yek ziman, yek çand ... hwd.

Şoreşên Buhara Erebi (bi xwe şoreşa hemû gelan e) ku bi şewazê raperînen gelêrî dest pê kir, bi awayekî mirî li Tûnisê ji dayîk bû, û piştê şîna wê li Misrê geriya, bi hevkarîya saloxgeriyên (îstîxbaratên) navdewletî û herêmî ku fermana binaxkirina hestiyên wê bi her teşeyên kirêt dan, û êdî tevgerên gelêrî veguhartin terorîzmê li şûna demokrasiyê, azadiya şoreşa gelê Sûriyê her wiha hêviyên gelê Sûriyê bi pêlan û kompoyan vemirandin digel (Tûrkiyê, Siûdiyê, Îranê) û bi agahdarkirina sîstema Beesî ya nijadperest û taîfeger, û bi pîrozbahiya biryara navendên navnetewî, wiha armanca şoreşa Sûriyê binax kirin û ji naveroka wê ya demokratîk ji bo guhartinê vala kirin.

Beşê şoreşa Sûriyê ya yekemîn, li Deraa ya leheng dest pê kir û zivirî Homsa dilsoz û Hema ya mêrxwaz ta gihişte Heleba serhildêr, bo xwîna şehîdên azadîxwaz. Ji Hemze Xetîb ta karvanên şehîdên bê dawîdi şoreşa me de, ên ku armanca wan bû ku rewşa civakî ber ve pêş biguhêrin û ji sitemkarîya ku (50) salî drêj kir rizgar bibin, ji xweew siyaseta xar û çewt ya li dijî wekhevî û biratiya gelan û siyaseta nijadperest ya bîrdoziya yek çand û tolîter rizgar bibin. Diva bû ew siyaseta ku tevahî dezgeh, sazî di xizmeta hinek desthilatdarên sitemkar û taîfeger ku kursî û saman xistine destê xwe rizgar bibin, siyaseta Bees nedihîşt ku saziyên civaka sivîl pêşkevin û tevizandineke neteweyî çêdikir û rikeberên niştîmanî, rewşenbîr û hişmendên welatparêz tune

dikirin, nedihîşt tu kes di biryaran û çareserkirina aloziyên civakî, siyasî û aborî de beşdar be, û ew bi xwe bibû asteng li pêş pêşketinê.

Sîstema Sûriyê roleke pir mezin di kûrkirina rizandin û kofkîbûna saziyên neteweyî de lîst û bi hişê xwe yê yeknetew afirand û diyar kir ku ne pêkane ev şêwazê rêveberiya netewdewlet bi ser keve, ku bi xwe metirsiyeke mezin e li ser pêşeroja gelan, û navlêka dewleta dijberî zayonîzmê û eniya berxwedanê li dijî dagîkirinê, dereweke kirêt e û maskeke qirêj e li xwe dane.

Heyama têgehên neteweyî yên çirisî û dîmagocîk raboriye û êdî nikare bi vê felsefeya rizî gel bixapîne, ew siyaseta siwarbûna xêza neteweyî ji bo parastina berjewendiyên xwe yên olperest û belavkirina bêbextiyan di navbera mezheban de, û lîxistina pêkhatayan bi hevudu re di Sûriyê de, û dayîna xelatên sîstematîk bo hinek kesên girêdayî vê sîstemê êdî zelal bû, ev hêmanên wiha zemîneke dewlemend bo hatina pêlên Buhara Erebi peyda kir, ku serhildanên gelêrî û raperînan ji Deraayê de heya tevahî xaknîgariya Sûriyê der ketin, ji bo rizgarbûna ji koletiya hemdemî û standina azadiyê.

Di destpêka xwepêşandanên gelê Sûriyê de, hêzên herêmî û navdewletî naskirin ku serkeftina şoreşa gelê Sûriyê, dê bi xwe re guhartinên li gorî berjewendiyên gelên herêmê bîne û ev rewş dê erdhejînekê di pergala dewletên zordest de çêbike, her wiha berjewendiyên êlperest û olperest gef bike. Lewre bi lez û bez hevrêzî û hevdengî di nava hev de çêkirin û bi taybetî jî sîstema Sûriyê û Îranê û bi hevalbendiyêke stratîcîk digel Rûsiya Federal ji milekî ve, û ji milê din ve, sîstema Siûdiyê, Tûrkiyê ku şoreş hembêz kirin û xistin bin bandora saloxgeriyên xwe û serxwebûna biryara wê desteserkin, nemaze, hinek komikên wê yên çekdar, ku wiha hinek nûnerên şoreşa Sûriyê bûn peyamnêr û nûçegihanên dewleta Tûrkiyê û Siûdiyê yên ku tu carî aştî û aramî ji Sûriyê û gelên wê re nexwestine. Ji milekî din ve, hevalbendiya Îran û Rûsiya ya digel rêjîma Sûriyê, bizavên mezin kirin ku raperîna gelê Sûriyê ya aştiyane bike şoreşeke çekdar, bi riya komlo û planên saloxgeriyên hêzên navdewletî, her wiha nakokî û bêbextî di navbera komên çekdar de kûr û gur kirin ji bo şoreş ji cewher û naveroka xwe ya azadîxwaz derkeve û dev ji armancên xwe berde. Ev livbaziyan komên çekdar hemû ketin xizmeta siyasatên mezhebî û taîfegerî, û gav bi gav şoreş beravêtî kirin û herêma Rojhilata Navîn bi giştî seferber kirin û agir li her bosteke xakê vêxistin. Lê hêzên gerdûnî yên çalak di aloziya Sûriyê de yên ku stûyên xwe bi vîtoya Rûsî ditewandin li navenda biryara navdewletî (Encûmena Ewlekariya Navdewletî) û bi hevkarîyeke yekser digel hêzên herêmî (Tûrkiyê, Siûdiyê û Îranê) li pişt perdeyan û bi veşartî û eşkere kar dikirin ta karîbûn hevsarê şoreşa Sûriyê bikişînin û hêdî hêdî bifetîsînin û binax bikin. Ew şoreş ku hîna di landikê de ye, û beriya dem di ser re derbas bibe, û naveroka şoreşê ji demokrasîyê vala kir. Mirov dikare sedemên destwerdana hêzên navndewletî û herêmî di şoreşa Sûriyê de û nexwastina wan ku çareseriyê bibînin di xalên wiha de şirove bike:

- 1- Tirs a dewletên herêmî ji serkeftina xêza gelêrî, demokratîk û azad, û divêtiya dengvedana wê li ser tevahî Rojhilata Navîn û bandorkirina li ser wan sîstemên girêdayî hêzên navdewletî û siyasetên wan ve, têkbirina hevsengiya demdirêj di navbera van hêzan de û lawazbûna berjewendiyên aborî yê qezenca teng û derbasbûna pêvajoya metirsîdar.
- 2- Tirs a ku Sûriye bibe baregeha xurtkirin û pêxwarindina şoreşên buhara gelan, û tirs a ji belavbûna têgeha şoreşa neteweya demokratîk, û wiha derî li hember vê şoreşê girtin, ku nebe pêşeng di guhartin û geşedana rûyê herêmê yê şaristanî, dîrokî û hevjiyana aştîyane û demokratîk di navbera gelên wê de.
- 3- Cihê Sûriyê yê cîyopolîtîk xaknîgarî û dîmografîk, girîngiyê didê, ku roleke bingeîn di guhartina nexşeya siyasî li Rojhilata Navîn di asoya nêzîk de, bilîze. Lewre, ew hêz deriyên şoreşa demokratîk digrin bi riya fetisandina bizavên çareserîya kêşeya Kurdî û hiştina Kurdistanê di bin destê hêzên dagîrker de (neteweyên Turkî, Farisî û Erebî) û ji nû ve vejandina hevpeymanî Qesira Şêrîn ya kirêt a ku Kurdistan kire du parçenavbera Împeratoriya Farisî û Osmanî de. Lê ema bi şêwazê berevajîkirina şer di navbera Sûriyê û Şîaa de û çêkirina hevalbendên herdu aliyên li gor berjewendiyên xwe.

Li ser bingeha van rastiyên jorîn, hevalbendan hevrêzî çêkirin û xwe kirin bavê şoreşa Sûriyê û rikeberîya wê û wiha rojeva parçebûnê avêtin ser milê alîgirên rikeberîyê û avêtin nav paytextên cihêreng yê cîhanê, her wek dergehekî rojeva nû li ser erdê, û ev rewşa hanê di kongireya Cinêvê (1-2) de, diyar bû û civînên Stanbolê ên ku bêtir rikeber tarûmar û şerpeze kirin, ku hêviyên Sûriyan binaxkirin, hewldana dawiyê jî, tempoya tundûtûjîyê pêve xistin û şerê navxweyî, mezhebî û taîfegrî gur kirin bi riya saloxgerîya navdewletî û herêmî. Girûpên tundre hişkbawer û tarî di bin navê îslamî de weke DAIŞ û xwîşkên wê aresteyî herêmê kirin û rûyê şoreşê guherandin û fişeka dawiyê li raperîna şoreşgerî xistin.

Her cureyek tundûtûjîyê, kuştin û rûxandinê bi kar anîn ta xêza şoreşa demokratîk a mirovahî û rewşa biguhêrin û pêlana li ser pêk bînin û naveroka wê ya sincî û mirovahî vala bikin û ji nû ve tevgera gelêrî ya aştîyane biperçiqînin bi rêbaza çekdarkirina şoreşê û kişandina Sûriyê û gelên wê berve şerekî navxweyî yê tehlûke ku hişk û terî dişewtîne, û tenê yê zîyanê dide ew gelê Sûriyê bi hemû neteweyên xwe û mezheb û taîfeyan e. Dema mirov bi kûranî derbasî şirovekirina rewş û mercên ku şoreşa Sûriyê gihîştîye, piştî sala xwe ya çaremîn, bi rastî mirov matmayî dimîne bêçare û bedbîn dibe. Ji ber ku çî deskeftiyên balkêş nehatin bidest xistin, lê navnîşana berz tenê rêtina xwînê, koçberî û tar û markirin e. Binyada jêrîn a aboriya welêt hate rûxandin, bêtir 12 milyon nişteciyên Sûrî penaber bûn bêtirî (5) milyon mal hatin rûxandin, bêtirî (200,000) dused hezar, pakrewan çêbûn û bi sed hezaran birîndar tevî hejmareke gelekî mezin ji girtî û windayî û kesên rûçiqandî û astengdaran.

Bi qasî berpirsiyariya rêjîma Sûriyê ji vê kerasetê, ewqasê jî, rikeberî berpirsiyar eji ber erkên xwe pêk ne anî û pêgirên niştîmanî li rûberî şoreşê û gelê Sûriyê bi cî neanî. Hemû destwerdan

û tevgerên tevlihev yên gelek komikên çekdar ewên ku weke paramîsiyonê zêde dibin, daneke jiyankirinê dan rêjîma Sûriyê û êdî dirûşma şikestina sîstemê li ser zemînê bûye (şikestina şoreşê û ji holê avêtina wê). Ev rewşa hanê hêz da rêjîma Sûriyê ku bêtir qirkirin û komkujiyan pêk bîne û hîna jî rêjîm li ser çareseriyê ewlekarî û leşkerî, û rê û rêbazên aştiyane û siyasî ku rijandina xwînê rawestîne, dixetimîne, lewre tu alternatîvên çareseriyê aştiyane û demokratîk ne pêkan in, ku sîstem pêşkêşkirina nexşerêyekê bo dawîkirina aloziyê napejrîne.

Her kes dizane ku Sûriyê aniha di rewşa şerê navxweyî de ye, û ber bi tûnelekî tarî ve dice, ji ber şaştiyên rikeberiyê bo şirovekirina pirojeyê çareseriyê niştimaniya riyalîti, û xwe nedana pişt hêza gel û berjewendiyên gelên Sûriyê bi hemû nêrîn û ayînen xwe yên cihêreg, rikeberî nebû hembêzgeha tevgera gelên dilcoş, lewre, gelek deste, encûmen çêbûn û hemû jî qaşo rikeber in. Lê bi gelemperî, ev rikeberî çî hêvî û omîdên gelê Sûriyê pêk ne anîn, tevî ku dibêje ew nûnerê şoreşê ye. Ev jî giş vedigerin tunebûna rêbaz û rêvebernameya hişmend û rast, her wiha rikeber binçîneya hevpeyvînê, goftûgoyê napejrîne (qebûl neke) ta lihevhatinek çêbibe ji bo stratîciyêke hevbeş ya pêşerojê û dahatûya Sûriyê û nasnameya wê û ya sîstem û pergala wê li beramberî civaka navdewletî, lewre ev rikeberiyê wiha heman nîgarek e ji rêjîma Sûriyê, ku çî mafên kêmtewan napejrîne û her kesî rikeber bergeh dike û nahêle çî kes pêşeroja Sûriyê deyne.

Nenaskirina rikeberiyê Sûriyê ji hevsengiya pîvanên hêzên navdewletî û berjewendiyên wan di danûstandina digel aloziya Sûriyê li gor guhartinên li nav herêmê, û hên bêtir nenaskirina rikeberiyê ji pêvajoyê re, û mijûlkirina digel pevçûnên ne stratîcîk li hember rêjîmê û nedîtina hevdengî û hevkarîyê meger ku leşkerî be, û dûrketina ji sincî û armancên şoreşê û beza wan li pey samanê û dewlemendbûnê û mulkiyetê ye û hên bêtir pêşxistina rêzêkustînan di bin navê îxanet û tekfîrê de, ev encamên hanê, meydan vekir bo belavkirina rêxistinên tundre ên girêdayî navendên saloxgeriyên herêmî û navdewletî, û wiha şoreşger û têkoşerên bi rûmet kuştin ên ku dikarîbûn şoreşê sererast bikin û têxistina di rîya rast de.

Evan çendî binkeftinên rikeberiyê yên li pey hevpayeya rikeberiyê lawaz kir û çî çareserî li pêş xwe nedîtin ji pêvî lavaj û bergera li ber rêjîmê û wiha jî rêjîmê şert û mercên xwe yên kirêt diyar û ferz kirin. Lê rêjîmê gelek baş qelsiya rikeberiyê naskir. Bê gûman, ev bûyer û rûdanên trajîdî nehiştin em bigihêjin çareseriyê û xwîn hên tê rijandin ji bo serfiraziya welatiyan û ji bo azadiyê, û nekarîbû deriyê vê dogehê ya bi destê hêzên tarî û koledar û komikên tekfîrî yên pir dûrî cewherê îslamê û ola paqij bigirtibana. Ev trajîdî hemû encamên parçebûna rikeberiyê û nezelalbûna nêrîn û bernameya rikeberiyê ye, ku nedikarî bi şêwazekî xweser bi aloziyê re bida û bîstanda digel helwestên keysebaz yên hevalbendên rêjîmê û xiniziya civaka navdewletî ji bo ku roleke durist û bi rûmet bilîze û erka xwe yê mirovahî şaristanî û dîrokî li hember civaka Sûrî rabe, ji ber vê me dît ku rîya herî baş ku vê aloziyê çareser bike, ew e ku gelê Sûriyê bi her pêkhatiyên xwe yên şêrîn xwe bikin yek û bandorekê li ser tevgerên siyasî û hemû aliyên

rikeberiya niştimanî bike, ku bi tevahî erkên xwe rabe, ev delameteke dîrokî ye li ser milê me û divê ku tevna civaka Sûrî ji nû ve were ristîn û peyv û axaftina rikeberiyê û armanc û bername bibe yek û xebata lezgîn li hundir û derve sererast bibe, û divê çî pêkhate, û her kesek, rolekî di danîna pêşeroja Sûriyê de bilîze, bêyî rewîştîyê awertebûnê, digel hemû kesayetên di nava rêjîmê de ên destê wan bi rijandina xwîna gelê Sûriyê nebûye.

Em herwek komeke ji bijardeyên pêkhateyên gelê Sûriyê (Ereb, Kurd, Ermen, Turkman, Asûrî, Çerkes, Durûz û hemû etnîk û rêolên din) ku em karibin xwe bigihînin hevudu û hêzekê biafirînin û rêbaz û mîkanîzmeke nûjen ji bo çareseriya aloziya Sûriyê deynin, lewre, me biryar girt ku em çarçoveya qalîn çêkin ta bibe dergehê ji riya çareseriya aloziyê re, li ser hêviya ku ev xebat di çarçoveya kongreyeke gelemper (gîştî) û bi amadebûna nûnerên tevahî pêkhateyên gelê Sûriyê ji her herêmekê ji hundir û derveyê welêt .

Rêgir û aloziyên mezin li hember Sûriyê, berpirsiyarî û erkên dîrokî û niştimanî datînin ser milê me, û divê ku hemû bizav û hewldanên xêrxwaz xwe bidin hev ji bo vê aloziyê, û piştî pêngavên pratîkî ji bo rikeberiyê dayînin, ku em hêzên xwe têxin çarçoveya xebateke çalak û lezgîn ku karibe bersiva vê pêvajoya şoreşa me bide.

Em gihiştin hinek encaman ku nêrîna me ji bo aloziya Sûriyê çareser dike, ew jî ev xalên jêrînin:

- 1- Rewşa Sûriyê bi hemû dûrbûn û belavbûna pirsgirêkê û encamên wê berhema siyaseta nijadperest û tolîterîst û rêveberiya dewletê û civakê ji mile dezgehên ewlekariyê û zêdebûna hêzên wan li ser milê dîrxistina civakê di çarçoveya hiştîya (zihniyeta) yek partî, û di bingehe de, ev bi xwe aloziya rêjîmê ye, her wek pergaleke siyasî, ewlekarî û aboriya jihevketî û rizî ye .
- 2- Guhartina cewherî û rastî (ne tenê di warê diruşman de, şikestina sîstemê) armanca hemû beşên civaka Sûriyê ye, û ev bi şêwazê tevger û şermazarkirinên aştiyane xwe destnîşan dikir bo çareserkirina girift û kêşeyên civakî yê welatiyan. Ev jî dûpat û tekez dike ku modêla dewleta neteweyî bê çare ye, û bêkêrbûna zihniyeta tolîterî û çanda nijadperest û rêola (taîfegerî) ye.
- 3- Tezekirina qedexebûna ferzkirina pirojeyên tolîterî, mezhebî, neteweyî û olî yê tundra û hişkbaweriya taîfegerî, ji ber ku Sûriyê welatê cêwazî û cihê rengiya çand, ziman, ayînên olî û nijada ye.
- 4- Destpêkirina têkoşîneke bê rawestan ji bo rakirina sîtemkariya ku demeke dirêj bi destê rêjîmê derbarê pêkhateyên civaka Sûriyê de dihate bi kar anîn, û derxistin û şirovekirina sedemên xweberî (objektîf) yê ku hişt civak di her radeyan de bigihêje vê rewşa aloz di warê siyasî, civakî, aborî û çandî de, piştî vegerandina mafên wan pêkhatîyan û bi taybetî yê Kurdan ji ber ku hem ji zordariya siyaseta nijadperestiya sîstemê û hem jî, ji zordariya civakî jî azar kişandin, ku bi şêwazê rêbazên awarte derbarê wan de pêk hatin.

- 5- Têkoşîn li beramberî çanda nijadperestî û hişkbaweriya olîli her deverê, û ji nûve vegera çanda niştimanî ya hevbeş li ser bingehaniştimaniya Sûriyê bo hemû kur û keçên civaka Sûriyê
- 6- Yekîtiya xaknîgarî û gelê Sûriyê û pêgirtina bi rewana çanda niştimaniya Sûriya giştî û nepejrandina zordestî û tundiyê û birêvebirina zimanê hevpeyvînê herwek pîvaneke pêwîst ji bo lihevkomîna tevahî beşên dijber, û dûrnexistina çî pêkhateyekê û sipartina ser bîncîneya(perensîba) komara demokratîk ji bo hemû zarokên Sûriyê li şûna dewleta nijadperest, neteweyî, mezhebî û taîfegerî.
- 7- Divê ku xebat ji bo spartin û afirandina sazûmaneke siyasî ku hemû civaka Sûriyê bi hemû pêkhateyan cihê xwe têde bibînin û pêgirî bi bîncîneya hevpariya neteweyî mîna hêmanekî çareseriyê bo hemû hêzên rikeberiyê û vegera li çanda hevjiyana hevbeş û aştiyane û olên lêborîner ta biratî di navbera zarokên Sûriyê de xurt bibe.
- 8- Xebat ji bo yekîtiya hêzên rikeber ên çekdar di çarçoveya saziya artêşeke niştimanî azad û dûrî xizmeta siyasî û stûxwarî û koletiyê ji rojevên navdewletî û herêmî re, û ji bo berevanî û parastina berjewendiyên gelê Sûriyê û parastina pêkhate û deskefiyên niştimanî.
- 9- Vexwendina ji bo kongireyêke niştimanî giştî û berfereh, ku nûnertiya tevahî Sûriyan di hundir û derve de, bike ji bo dîtina bername û nexşeyêke çareseriyê aloziya Sûriyê, digel hevkarîya dewletên dost û hêzdar di biryara cîhanî de, û destnîşankirina nasnameya sîstema rêveberiya Sûriyê ya pêşerojê.
- 10- Ektîfîkirin û geşedana encûmenên bajaran û saziyên civaka sîvîl û dayîna van saziyan ew rola sereke di rêveberiya karûbarên civakê di çarçoveya zagonên hatine destnîşankirin de.
- 11- Komkirina tevahî hêzên leşkerî û damezirandina hêzeke asayîşê ku rola polîsê bike ji bo jevkirina pevçûnên herêmî û parastina destkeftî û mulkê gel û parastina sazî, encûmenên rêveberiyê bo meşandina karûbarên gel.
- 12- Pejrandina bîncîneya yekîtiya maf û azadiyên tekane û komane, her wek yekîtiyêke sergîhayî, di dema rêvebirin û bicîkirina zagonên sîvîl ji bo rêxistinkirina civakê û di çarçoveya sincî û yasayên çanda gelê me yê cihêreng û olên paqij û aştiyane de.
- 13- Rêzgirtina bîncîneya sinciyê û wijdanê di pêkanîna dadmendiya civakî, ji ber ku wijdan cewherê sincî û ol e, lê eger wijdan wînda bibe, mirov hingê, ji qada mirovahiyê derdikeve û êdî bîncîneya zordestî, desthilatdarî û tundiyê li ser rewîşt û karê wî-wê mirovî û piştî dijminahî û napejirandina kesên din dike û ditê bi kar anîn.
- 14- Geşedankirina qada aborî û vekirina riyên hatin û çûyîna tiştan û madeyan ji bo peydakirina pêwîstî û pêdiviyên civakê ji mile xwarin, vexwarin û peydakirina madeyên bingehîn û danîna mêkanîzma vejîna binyada jêrîn û geşkirina aboriya niştimanî û saziyên rêvebirina aboriya çandînî, bazirganî û pîşesazî.

- 15- Guhdariya li saziyên tenduristî û vekirina delîveyan bo kadroyên ku ji bo vekirina navendên tenduristî dixebitin, û peydakirina dermên ta dawî li nexweşiyên vegirtinê û demdirêj bête kirin di nava welatiyan de, û nemaze di nava zarokan de.
- 16- Divê rola jinê neyê paşguhkirin û ji ber jin nîvê civakê ye, û mirova herî mezin ku zîyan dîtiye ji vê bêtar û belayê, ji ber jin dayîk e, hevjin e û buhaya herî mezin ji dest daye, ev siyaseta zordariyê ya ku li civaka me belav bûye, jin û ji ber ya herî sîtembar e û ji ber hemû şeweyên tundûtûjîyê û zordarî ya ramiyarî û fîzîkî li ser wê hatiye meşandin, îroj di ev rêxistina serwer de (dewleta neteweyî û sîstema nûjentiya sermeyedar) ji tevahî mafên xwe bêpar maye û jin tê bikaranîn di rêklamên firotina mewan de, û bi buhayeke pir erzan, hatiye jibîrkirin ku rola jinê pir mezin e di hevsengiya civakbûyînê de, û divê ku rol û payeya xwe ya xwezayî û xweristî di tevahî deste û encûmenan de bistîne.
- 17- Vexwandina penaber û koçberên ku li derveyî welêt were kirin, nemaze xwediyê kêrhatiyên pispore di beşên zanistê de û beşdarbûyîna wan di avakirinê de û dûmahîkirin li windabûna wan li biyaniyê .
- 18- Dûpatkirina têkoşîna ji bo guhartina ew rewşa bêtariyê (tirajîdî) û bikaranîna her rêbazê bo rizgarkirina Sûriyê, gel û erdê, pêşveçûyîna Sûriyêke niştimanî û damoqratik ji her welatiyekî û her pêkhatyekê re, dîrokî ye.

Ji ber van sedeman, em bangewazî li tevahî hêz, ol û komên neteweyî yên demokratîk û olên lêborîner dikin ku Sûriyê gel û erd rizgar bikin, ta ku bigihêjin heman nêrînê û hevdu bipejirînin, ji bo em bigihînin rikeberiya niştimanî ya rast, ku dikare hemû pêkhatiyên Sûriyê di nav xwe de hembêz bike, û nûnertiya wê bike, di çarçoveya stratîciyê berfireh û li ser vê çandê, têkoşîna niştimanî û goftûgoya xwe ya siyasî bispêre, û ta em karibin gelê xwe û axa xwe ji tunebûnê û nenasiyê felatikin.

Ji lewre, divê rikeberî xwe bispêre ser hinek perensîb (binçîne) û rajoran ta ku karibe vê aloziyê çareser bike, ew aloziya ku tevahî hêzên civaka navdewletî nikaribûn çareser bikin.

Komîteya Hevrêziyê

Hevalbendiya Niştimanî ya Demokratîk a Sûrî

Malpera Fermî ya hevalbendiya Niştimanî ya Demokratîk a Sûrî:

www.twds.info